



## Şêx Saîdê nemir li ber dadgehê



Cankurd / 1998

Sergotin:

Bêguman li ser hilperîna 1925'ê, ya ku bi rêberiya şehîdê nemir **Şêx Saîdê Pîranî** ciyê xwe yê bilind di mêjoya gelê Kurdistanê de girtiye, pir hatiye nivîsandin û raçavkirin. Lê di piraniya wan berheman de, pirsek heye, ta roja îro baş nehatiye bersivdan. Pirs jî eve:- **Gelo! Ev serhildan ji bo serxwebûna Kurdistanê an jî ji bo avakirina dewleta rêbazê (Şarîe't) bû? An ji bo herdukan bi hev re bû?**

Gelek dîrok nasên me, û li gel wan pir nivîskaran, ên ku dixwazin wê bo nêrînên xwe yên ranyarî bihênin zimên, di gotar, pirtûk û axiftinên xwe de vê pirsê bi terzekî nezanyarî tev li hev dikin. Hema di vir de lêkolîna mamhostayê mafparêz "Advokat" **Osman Aydin** "Kürd Ulus Hereketi- 1925" (Tevgera Netewa Kurd- 1925) xebateke hêja û bebirçav e, lê mixabin! Wî pirtûka xwe ya di mafê şêxê nemir û serhildana wî de bi Turkî nivîsandiye. Li ba kak **Osman** ji bo bersivdayîna pirsê me ya jorîn hinde xalikên mezin diyarin.

Di rojên semînara "Diyaloga Kurdan bi Kurdan re" li bajêrê Bonnê (19 - 21. 06.1998), ya ku ji aliyê **Navendê** ve (*Kurdisches Informations - und Dokumentationszentrum e.V.*) hatibû diristkirin, hêja **Osman Aydin** bo min got: "Ev çend rûpelên bi nav destên xelkê ketine û hinek jêgirt (nusxe) ji wan, di wê demê de gihane Europa û bi çend zimanan hatine belavkirin parek ji îfadeya şêxê nemire e, û bi armanca tirsandina Ewropîyan ji serhildaneke, ku paşdîwarê wê îslamî bû, bîn tirsandin. Eger Turkan bigota ev serhildan Kurdistanê an neteweyî ye, Ewropî wilo li dij nedibûn, lê Mustafa Kemal xwast, ku wan ji Islamê bitirsîne û lew re di wan pelikan de hîç tiştê li ser (Azadî) derbas nabe. Dosiya Şêx Saîd, ya ku min bi çavên xwe dîtiye dosiyeke pir mezin e û di nav wê de jî berê dosiyeke **Xalid Cibraîlî** hebûye, ji nav wê hatiye derxistin û ew şiyandine General Qurmay."

Bi rastî tişteki yad e<sup>(1)</sup> “*xerîbe*”, ku Mamosta **Şêx Ebdulmelîk Firat**, ku yek ji endamên malbata **Şêx Saîdê** nemir e û wî gelekî xwe bi wê pirsê re mijûl kiriye, li gor axiftinên, ku min ji devê wî bihîstine; ew serhildan neteweyî-îslamî bû ye, ji ber ku baweriya şêxê nemir tenê bi rêbazê (*Şarîe't*) hebû û xebata wî jê re teviya jînê girtibû. Baweriyên çep an rast li ba wî cî negirtibûn û ew neketibû hîç saziyên demokrat an sosiyalîst. Ew olparêz û xwedanêz bû.

Wekî ku rastîniya serhildanê û belavbûna wê di nav gel de cî girtine, diyare ku gelê Kurd li gel **Şêx Saîd** bû û hîn jî li gel şop û rêça wî ye.

Wekî ku têkilî û hevdiştinên **Şêx Saîd** li gel niştperwer û welatparêzên bi nav û deng xweya dikin, ku niştixwazên Kurd bizava xwe bo hevkarîyeke xurt li gel **Şêx Saîd** dikirin. Hinek şorişên pir dirêjtir û serkeftîtir ji ya şêxê nemir di dîroka me de hene, lê çî serhildanê wek ya **Şêx Saîd** dilê gelê Kurd bi ser xwe ve ne aniye. Tê bîra min, ku dema ez xortek bûm, li gundê me dewatek li ser bêderan çê bû û çend rojan dirêj kir. Gelek stranvanan û dengbêjan distran. Lê dema ewîlekî dest bi strana **Şêx Saîd** kir, keyê gund û hinek kesên ku ji fermadariya Sûrî li **Çiyayê Kurdan** ditirsîn, xwastin wê stranê bi zorê rawestînin. Xort û ewîlan ya xwe bi ser xistin û dema stranvan ew parçeyê strana xwe bir serî, hemî kesên bi çek bûn, devên tivingan ber bi jor ve kirin, gumirtî û teq-teqî bilind bûn, çiyayê **Keloşkê**, yê ku li hember gundê me ye, deng veda... Te digot qey ceng e.

Ez di vir de gotina xwe dibirrim, ku bo xwendevanên hêja wan çend pelican, ên ku ji dosiya şêxê nemir ve hatibûn belav kirin û ji nav têksta (*metina*) dadberkirina **Şêx Saîd** li ber **Dadgeha El-Îstîklal** sala 1925'ê, wergerînim bo Kurdî, ji ber ku ev par ji dadberkirinê, çiqas kin be jî, ruhniyekê davêje ser wê bûyera dîrokî, ya ku ta roja îro hêz û germiyê dixîne dilê her kurdekî niştperwer. Ev metnê dadberkirinê wê bo bersivdana pirsê me ya jorîn gelek alîkar be:

**Pirs:** We li kî derê xwend?

**Bersiv:** xwendina min a zanyarî li dibistanên îslamî li **Mûş, Melazkird û Palo** bû.

**P:** Hûn li wir di dibistanên olî (*dînî*) an yên fermî de û li ser destê kê fêr bûn?

**B:** Erê, ez di dibistanên olî de ho bûm û apê min **Şêx Husên Palo** maostayê min î yekem bû. Pişt re min li ba **Şêx Muhammed Emîn Efendî xwend**, yê ku li **Palo** muftî bû û **Şêx Evdellah** li **Melazkird** û **Şêx Mûsa Efendî** li **Xinîs**.

**P:** We çî xwend?

**B:** El-Enwar, El-muherêr, Rêziman, Serf, El-Mea'nî, El-Îşare, El-Beyan, El-Badî' û pirsên bi baweriyên (El-E'qaêd) ve girêdayî..

**P:** Çewa ramana îsyane (*Isyan*) hat ba We? <sup>(2)</sup> Ma tişteki hebû, ku Hûn bi ser vê yekê ve kişandin an bo We îlham daket?

<sup>1)</sup> Di stranên kurdî de gelek caran yadê..yadê ..tê gotin. Lê mebest ji wê ne dayîk e. Ji ber ku di kurdî de yad “*xerîb*” e.

<sup>2)</sup> Bo rêzgirtina **Şêx Saîd** gelek caran gilîvanê turk:We..Hûn bi kar aniye, lewre me bi tîpên gir nivîsandine û hinde caran jî (tu.. Te) bi kar aniye, me jî wilo hêştiye.

**B:** Çi îlham negiha min, lê ez ji nivîsên min xwendine fêr bûm, di rewşa ku fermanîdar rêbazê (*Şarî'e'tê*) bi kar neyîne, pêwîste serî li wî bite hildan. Min dixwest, ez dîtina me ji fermanîdariyê re xweya bikin, û bi kêmtirîn di warê bi kar anîna rêbazê de. Lê Xwedê tea'la xwest ku em bikevin nav vê serhildanê, ewa ku me hew dikarî jê derketana, piştî ku bûyeran destpê kir.

**P:** We got ku derketina li hember fermanîdar di rewşa ji kar derxistina rêbazê de histobariye (*wacib e*). Ma ji bo vê pirsê hinek girêdar nînin?

**B:** Ez dizanim, ku bi kar anîna rêbazê histobarî ye û ez hîç tiştêkî ji girêdarên we nîşan kirine nizanîm.

**P:** Wilo em ji vê yekê têdigihin, ku di rewşa hebûna şaşiyekê de, li ba pêşewa (*îmam*), mafê her mirovekî ye, ew dest bi serhildanê bike, ne wilo ye?

**B:** Na... Min wilo negot û di serî de di dilê min de tune bû, ku ez serî hilbidim. Ez ketim bin hinek nîrên, ku zora min birin... û min negotku hema bila her kesek dema şaşiyekê di fermanîdar de bibîne, çewa dixwaze serî li fermanîdariyê hilbide, lê min got: **Derketin di rewşa ji kar derxistina rêbazê de histobarî ye.**

**P:** Ma diyarkirina We ji îsyanê re, ji baweriya We ye ku rêbaza îslamî li vî welatî hîç bi kar naye?

**B:** Nivîsar (*Qurana pîroz -Wergêr*) li ser radiweste, ku derketina li hember fermanîdar di wan nîrên, ku me li jor nîşan kirine, bi cih tê... û bi karanîna rêbazê, yanê berbestkirin "*qedexekirin*" kuştin, zînekarî û meyxuriyê ye...û..d... û bi hemdê Xwedê em tev musulmanin û bo vê yekê pêwîste cudahî di navbera Kurd û Turkan de tune be, û li gor baweriya me, ev kar niha hatiye berdan û me ji baweriya xwe û li ser bingeha Qurana pîroz destpê kir.

**P:** Şêxê hêja! Em dev ji van pirsan berdî û ji me re egerên rast bo îsyanê bibêje..

**B:** Li Pîran bûyereke çêbû. Ew jî pevçûneke çekdarî bû û ji herdu aliyan kuştî hebûn û histobariya vê bûyerê ket ser stûyê min, tevî ku min bi rastî ji fermanîdarê cendirme xwest ku girtî bî berdan, lê efser û serokên wan sê caran bi keviravêtina jinan (*jinberdan*) sûnd xwarin, ku wê girtiyan berdî, lê bi ya xwe kirin û girtî bi zorê li gel xwe birin.

**P:** Ma Hûn berî bigihin **Pîran** Hûn toşî îsyanê bûn?

**B:** Herê! Lê ew hat toşê min bû. Hîç rêberiya tevgereke çekdar ne di hişê min de bû. Ez dihoşim ku bi fermanîdariyê re li ser bingeha pîvana zagonên, ku li vî welatî derdikevin li gor fermanên rêbazê ne an ne... û min nê kiribû, ez van daxwazan bo **Encumena Nûneran** (*Meclîsa Mebu'san*) bişînim.

**P:** Bo çî te ew bi nivîs bo fermanîdariyê neşand?

**B:** Heger pêşewa (*Îmam an serek- Wergêr*) rêbaz bi kar ne anî, derketin li hember wî histobariyêke rêbazî ye (*wacibekî Şarî'î ye*) û min xwest ku ez rûyê xwe li ber Xwedê bêsiuc bikim.

**P:** Lê Şêxê hêja! Te berî niha got ku musulman biran e. Ma dibe, ku mirov wan bo şerê

dijhevî tûj bike?

**B:** Bawermend biran e, lê dibe ku carina dijî pêşewa di hinek rewşan de bite şerkirin. Wilo *Qurana pîroz* dibêje.

**P:** Lê ez têngihim çewa mirov dikare xelkê bihevoje bo pevçûnê di nav wan de û ewan birayên hev û din in di olê (*dîn*) de?

**B:** Ma ewên şerê **Elî** kirine ne birayên hev bûn di olê de? Pevçûn carinan di nav birayên olê de jî bi hev dikeve “pêda dibe”.

**P:** We kerem kir got, ku **cîhad** histobarî ye (*wacib e*) di rewşên ku li jor hatine navkirin. Lê helwêsta cîhadê wê çi be, gava ên gawir destê xwe deynin ser zevînên (*erd*) musulmanan û rûmetiya Quranê erzan bikin?

**B:** Di wê rewşê de cîhad dîsa histobarî ye.

**P:** Gava Yûnanan destên xwe dane ser vî welatî, bo çi tu û çar hezar merivên te neçûn pêşberiya wan?

**B:** Di wê demê de em gelekî dilxwazên çûyîna bereyê (*cebhê*) bûn û heger fersend ji me re heba, em li şûn nediman. Me xwe amade kir, lê ji me re gotin ku ewan me naxwazin û tevî ku em hejar û penahber bûbûn jî, me yê xwe nedaba paş, heger ji me bihata xwestin.

**P:** We li kî derê bo vê fermanşikandinê (*Isyan*) pîlan kir û kî li gel We bû?

**B:** Çi amadekirin ên serekîn tune bûn. Li **Pîran** bûyerek çê bû û em ketin di nav de. Lê gava ez giham **Lîcê** ez bi kesekî re, ne bi dizî û ne aşkere, li ser serhildanê nepeyivîm. Berî serhildanê bi kesekî re li ser amadekirinan min şor nekiriye.

**P:** Piştî çend rojan ji vegera kurê We **Elî Riza** ji **Îstanbulê** serhildan pêda bû?

**B:** Şorişê piştî mehekê ji vegera wî ji **Istanbulê** destpê kir.

**P:** Kurê We li ser îsyanê bi kê re peyivî bû? û çi agahî wî bi xwe re bo We ji **Istanbulê** anî bûn?

**B:** Ew bi carekê li **Istanbulê** di warê serhildanê de bi kesekî re nepeyivî bû û gava ez giham **Erzerumê** (*Erdê Romê-Wergêr*), min bawer dikir, ku **Xalid Beg** wê bê, lê ew nehat û kurê wî li şûn wî hat û got ku bavê wî hatiye girtin û min berî wê yekê tiştêkî wilo nebihîstibû.

**P:** Lê piştî vegera kurê We êdî me di cî de bihîst, ku axiftin li ser rêbazê tê kirin. Ez bawer dikim, wî tiştêk ji **Istanbulê** gihandibû We.

**B:** Herê! Ji min re got ku ew bûbû mêvanê kurdekî ji **Xinîsê** û pişt re serî li seyda **Evdilqadir efendî** dabû.

**P:** Bo çi **Elî Riza** çû bû **Istanbulê**?

**B:** Hinek pez biribûn û firotibûn bazarganên **Helebê**.

**P:** Piştî vegera kurê We ji **Istanbulê**, We ew li kî derê dît?

**B:** Min ew li **şoşirê** dît.

**P:** We gotibû, ku cendirme hatin gund û ew bûyer çê bû.

**B:** Heger wan kuştî di nav cendirme de çênebana, dibe ku me histobariya xwe bi rêya namekirinê çareser bikira.

**P:** Bo çi We xelk bo îsyanê di rûyê cendirme de, ku bi histobariya xwe radibûn, tûj kir?

**B:** Rabûna cendirman bi histobariya xwe ji bo min ne ciyê pirsê bû. Lê ji ber serhişkiya wan, tevî ku min ewan azar kirin (*nesîhetkirin*, Azer: *nesîhetkar*), pevçûn çêbû.

**P:** Ma tiştêk, tevî azara We ji aliyê wan ve çê bû?

**B:** Herê! Pevçûnê destpê kir.

**P:** Ma ew bûyer çewa bû egera tûjkirina xelkê bo îsyanê?

**B:** Piştî min dest ji gund berda serhildanê destpê kir û min xwe dît ku ez ketime seriyê wê tevgerê.

**P:** Serhildanê destpê kir an ne? Pişt re hûn bi rêberiya wê rabûn an ne? Ne wilo ye?

**B:** Berî ez têkevim **Darahênê**, şorişvanan ew xistibûn çember kirinê.

**P:** Hatina cendirmeyan ne bû egera îsyanê. Ji berê ve agahî û pîlan ji bo wê hebû.

**B:** Heger ev bûyer çeneba û cendirme nebana eger, dibe ku ji kewxî<sup>3)</sup> (*tenaqud*) bi deslatiyê re bi rêya namekirin û denglêkirinê bihata çareserkirin, an dibe ku serhildan şeş mehan an jî salekî bihata bi şûn ve xistin, an jî ew bi carekê çenedibû.

**P:** Bûyera cendirmeyan bûbû Hîncek (*hiccet*) ji bo bi cîh anîna pêşnêrîn û pêşxwaziyekê. Heger cendirme nebana jî, wê fermanşikandin piştî şeş mehan li dar keta.. Ne wilo ye?

**B:** Heger ewana nehatina, dibe ku wan bûyer çê nebana... Lê qeza û qedera Xwedê ye.

**P:** Ez dibînim, ku Hûn her tiştêkî vedigerînin qeza û qederê... lê çewa mirov dikane (*ji kanînê-Wergêr*) para dilxwezî û viyana mirov di vir de nenase?

**B:** Herê! Pirsê hilbijartinê di vir de heye, û ez înkâr nakim, ku ez mirovim, bo min pêhoşî (*Şuûr*) û dilxwezî hene, û ez ji van tiştan ne vala me.

**P:** Ma Hûn bi tenê xwe bi îsyanê rabûn? Ez wê bawer nakim, ji ber ku bo We piştvan hebûn.

**B:** Kesekî em tûj nekirin bo serhildanê, ne ji hindir ve û ne ji derve ve, û mebesta min ji derve: biyanî. Çi hêzan ji hindir Tûrkiyê ve piştvanîya me di vê yekê de nekir.

**P:** Em dikarin ji vê yekê têbigihin, ku amadekirina serhildanê tenê ji we de bû?

**B:** Herê. Ev di hişê min de bû. Min dixwest, ez mirovên zana, cîhbilind, û nûneran (*yên ku nûneriya gel di parlemana turkî de dikirin-Wergêr*) bibînim û li gel wan biaxivim û daxwaza vegerandina bi karanîna ferman û sûdên olê bikim. Ev hêvî di dilê me de hebû.

**P:** Ma te şîreta nûner û zanayan kir?

**B:** Ez pê ranebûm û min nikarî bû, ji ber ku ew bûyer çê bû û çî bergeh (*mecal*) ji me re bo wê yekê nehêşt.

**P:** Di nameyên ku bi navê We hatine îmzekirin, We xwe bi “**Mîrê mucahîdan**” nav kiriye.

**B:** Di serî de dema ji bo xebitandina mîran, yên ku di bin fermana min de bûn, min name bi îmzeyê “**Mîrê mucahîdan**” dişandin, lê piştî demekê, dilê min li ser wî navî rûnenişt, lew re min nameyên xwe bi navê “**Xadimê mucahîdan**” şiyandin, ji ber ku ez

<sup>3)</sup> Ji pevçûna Kewan hatiye û wek wê jî kewkewî heye.

bûm berdestê wan.

**P:** Ma Hûn bi hişê xwe şêwirîn, berî ku Hûn hêriş ser **Diyarbekirê** bikin, bi mebesta têxistina wê bin destê xwe?

**B:** Ez ne alîgirê hêrişa ser **Diyarbekirê** bûm. Hinek axa hebûn, wan ew pîlan kir.

**P:** Niha Hûn têgihîştin ku We nikarî bû **Diyarbekir** vekira, lê pirs eve, ka çi Hûn dan bawerkirinê, ku vekirina wê asan e?

**B:** Me bawer dikir ku wê hinek pevçûn çê bibin, lê li dawî, wê serkeftin ya Kurdan be, lê ew çê nebû.

**P:** Ma We hêvî dikir ku wê piştgirî ji hindir **Diyarbekirê** ve ji bo We hebe?

**B:** Herê. Me ew bawer dikir û hêviya me di xelkê bajêr de hebû.

**P:** Tê gotin ku **Cemîl paşa** û **Neqîb Zade** ji piştvanên We bûn... Ne wilo ye?

**B:** Ez kesekî nas nakim, lê wek min bihîst, **Ekrem Cemîl** û **Neqîb Zade** li gel rêbazê (*şarîe't*) bûn. Ez wî nas nakim, lê min bihîst ku ew li gel rêbazê ye û wê piştvaniya min bike heger ez hêriş ser bajêr bikim, lê tenê min wilo bihîst û ez nizanim, ka ew rast bû an ne.

**P:** Lê ne wê çêtir ba, ku We agahiyên wilo giring bi cîh bikirana?

**B:** Di dema serhildanê de gelek gotin û derew habûn, ku bê tixûb û bê çavdêr bûn. Bo nimûne: hat gotin ku **Mûş** hatiye vekirin, lê pişt re ji me re diyar bû, ku evana nûçeyin derew bûn. Li ba me ne poste hebû û ne jî çareyên hevghihanê (*Communication*), ku van nûçeyan bi cîh bikin.

**P:** Heger ev tev ne rast bû û çi eger jê re nebû, çewa xwînretina xûnê di nav zarokên neteweya **Muhammed** de tê rêbazkirin.

**B:** Belê ev çê bû, dema hêriş li ser **Darahênê** û li ser **Xinîsê** çêbû ye. Ez dizanim ku rêtina xûnê pirseke ne rêbazî ye, lê min destûra rêbazî (*Fetwa*) jê re girt.

**P:** Kî serekê hêrişa ser **Alazîzê** (Alaziş) bû?

**B:** Berê min **Şêx Şerîf** li wê bereyê ferman kiribû.

**P:** ...û serekên din kî bûn?

**B:** Min bereya **Gazîkê** jî dabû bo **Şêx Şerîf** û min ji wî re gotibû; femandariya te heta **Palo** diçe. Min **Şêx Evdillah Melîkanî** bo **Kêrvanî** û **Mûşê** ferman kiribû û **Şêx Hesên** bo **Kîfê**, lê **Şêx Hesên** negiha wir û serleşker ji serekên êlan û keyên (*muxtarên*) herêman bûn. Li ba min leşkerekî karmend tune bû, lew re diviya ku ez herdem bo wan binivîsim, bi mebesta karnîşandanê.

**P:** Ka em bibêjin, We kanî bû **Diyarbekir** vekira, niyeta We piştî wê çi bû?

**B:** Em ditêkoşîn, ku piştî vekirina **Diyarbekirê** li gel zana û hêjayên bajêr rûnin û li gel deselatîyê bipeyivin. Bi ser ve jî me yê meyxurî (*Al-koh'ol*) berbest "qedexe" bikira û me yê dibistanên olî dîsa vekirana.

**P:** Ma vekirina **Diyarbekirê** pêşgavek bû bo avakirina **Kurdistaneke serbixwe**?

**B:** Avakirina Kurdistaneke serbixwe an jî tişteki wilo di dema serhildanê de ne dihat bîra me. Em tenê dihoşîn; çewa rêbazê bi kar bînin û ne min serokatîya dewleteke kurdî dipejirand û ne jî min dikarî ew bikira.

**P:** Li ser vê yekê belavokek heye. Ma tu agahdarî bi wê belavokê?



**B:** Ez ne wê belavokê dizanim û ne jî dizanim kê ew nivîsandiye.

**P:** Bila em bibêjin, We **Diyarbekir** vekir û We li gel femandariyê dan û standin bir serî û wan guh neda bo daxwazên We. Ma Hûnê wê demê amade bana, ku ji bajêr derkevin?

**B:** Ez li vê yekê niyaz nebûm, lê tiştê ez dizanim, ewe ku endamên **Encumana Nûneran** kesin oldarin, lew re min xêr di wan de hêvî dikir, ku ewê daxwazên me bipejirînin û dibistanên zanyarî (*mebest yê nîslamî- Wergêr*) dîsa vekin.

**P:** We çewa wêrî bû li hember hêzên komara turkî ya musulman derkevin û We dizanî ku van hêz dikarin We bi tevî qir bikin?

**B:** Li ba me çî nîşanên dirist ji bo ewqas hêzbûna leşkerê tune bûn û min guman nedikir ku bi evqas hêz û bi vê dilgermiyê wê bîn ji bo lêdana me.

**P:** Tevî We ev niyaz nekiribû, ma tu niha toşî vê yekê bû?

**B:** Herê.

**P:** Şêxê hêja! Em tika dikin, Hûn me agahdar bikin, ka ev ferman-şikandin encama pilanekê bû an jî bûyereke ji xwe berê bû?

**B:** Ez nizanim kî di ber vê yekê de berpirse.

**P:** Çewa dibe, ku parek nişt (*weten*) ji femandariyê bite cuda kirin û pişt re Tu dan û standinê vê re çê bikî û tu fermanê bidî wê, ku vê armancê an vê bi cih bînî... Ma ne çêtir e ku li gel femandariyê berî serhildanê li ser wan daxwazan bihata peyivîn?

**B:** Wextê em hilanîn.

**P:** Heger daxwazên We nehatina cî, We yê çî bikira?

**B:** Heger femandariyê daxwazên me nepejiranda, me dilê xwe vedihesand, ku me histobariya xwe kir û em li mala xwe rûdiniştin. Di hişê me de niyaza mişextbûnê (*hîcret*) jî hebû... û heger deselatiyê rê ji bo mişextbûnê nedaba, me xwe bi kêmtirîn ji wê bêûc dikir.

**P:** Ji nameya ku te hinartiye bo gundê **Lîcê** xweya dike, ku hûn bi pêşkariyên di warê amadekirina îşyanê de radibûn.

**B:** Ez ne nivîsarê wê nameyê me û di ber hindirê wê de ez ne berpirsim.

**P:** We got ku piştî hilgavtina tevgera îşyanê, Hûn bûn rêberê wê. Heger di navbera We û fermanbirran de pêşpilanî tune bû, çewa hemî wan xelkên, ku hûn wan nanasin We mîna rêberekî ji xwe re dipejirînin?

**B:** Dema ew bûyera **Pîran** çêbû ye, ez li herê mî bûm û ew jî daxwaziya Xwedê tea'la bû, lewma ez ketim rêberiya hilgavtinê. Lê eger ji bo serhildanê hinek pêşpilan hebana, wê rewşa wê ne wilo ba.

**P:** Çî pirs ji fermanên rêbazî li ba We ciyê giringiyê bûn?

**B:** Berbestkirina meyxuriyê.

**P:** Ma niha zagoneke qedexekirina meyxuriyê tune ye?

**B:** Berê zagonek bo vê taybetê hebû, lê me bihîst ku ew hat rakirin û bi karanîna "**tixûban**" (*zagonên dadmendiya Xwedayî-Wergêr*) bo kuştinê, zînakirinê û derketina ji olê hatin rawestandin.

**P:** Hûn bawer dikin, wan serbazên ku hatibûn herêmê, ji bo li hember îsyane rawestin, gawir bûn an musulman bûn?

**B:** Min ewan dîtî û ewan musulman bûn.

**P:** Gotineke pêximberî heye dibêje; kî li dijî me derkeve, ew ne ji me ye. Ma ev rast e?

**B:** Herê, gotineke pêximberî ya mîna vê heye.

**P:** Em ji We tika dikin, şirovekirina vê gotinê bibin serî.

**B:** Herê, ev gotin heye. Lê heger derkeftin ji bo olê be, rê bo wê heye û min jî ev derketin ne ji bo mafên xwe yê kesianî kiriye. Min wilo ol diparêzt. Gotin dibêje; **Kê şûrê xwe li hember me rakir, ew ne ji me ye.**

**P:** Ma kesekî musulmanan ji te zanatir û olparêztir tune bû? û heger hinek din hene, ji bo çi tu bi tenê bi vê yekê rabû?

**B:** Herê, gelek zana hene, lê dibe ku ew ji ber sivikiya hiş bû an ji ber hinek egerên din bû. Ez wan nizanim.

**P:** Heger Hûn rast giliya rakirina rêbazê ji ortê dikin, ma ji bo çi zanayên din jî ranebûn?

**B:** Li vî welatî di rêbaznas û xwendekarên rêbazê de hevgotinek “*Îcamaa’*” heye, bo giringiya ji nû ve bi karanîna rêbazê, lê zana li ser xwe û li ser rizqê xwe ditirsin.

**P:** Wilo tu zanatirîn û wêrektirîn zanayî..Ne wilo ye?

**B:** Ez ne zanatirê wan im, lê ez ketim di jawariyan.

**P:** Çi demê We **Palo** hêşt, bi mebesta çûyîna **Pîran**?

**B:** Di meha çileyê pêşîn de “*sala 1925'ê-Wergêr*”.

**P:** Ma ev dikeve hişan, ku kesekî mîna We cî û warê xwe di salbirka “*demsal*” zivistanê de, ya gelek sar e, bihêle?

**B:** Tunebûna ciyên baş, rewşên teqsa kirêt û bi ser ve jî kêmbûna hêzingiyê “*Wuqûd*” hêştin em her rojekê tenha sê *sae'tan* bi rê de bin.

**P:** Ma Wê ne çetir ba, ku Hûn di destpêka biharê an payîzê an jî havînê de biçûna?

**B:** Em di salbirka havînê de bi serlêdanên mîvanan û karên bazirganiyê ve mijûl in. Lê di çileyê pêşîn de bo me dem heye.

**P:** Isyanê çiqas dirêj kir?

**B:** Bêhtir ji du mehan.

**P:** Wilo be We dest ji cîh û warê xwe du mehan berî destpêka îsyane berdaye û bi egera “*hîncâ*” geryanê “*geştê*”. Lê pişt re di demeke kurt de tevgera îsyane destpê kir. Ma Hûn têkiliyekê di navbera malberdana We û destpêkirina tevgera îsyane de nabînin? Li gor gotina We, di dema ku berî îsyane çê bibe, We rojnameya “**Sebîlurreşad**” dixwend. Ma Hûn bawer nakin, ku wê tiştêkî ji îlham û piştdayîne ji bo destpêkirina tevgera îsyane dabû We?

**B:** Herê. Serhildan dihat bala min, lê di dilê min de tune bû, ku ez destpê bikim, di dema ku ew çê bûye. Ew ji xwe serê çê bû.

**P:** Ma kurê We çû bû **Helebê**?

**B:** Herê. Kurê min bo karin bazarvaniyê çû bû **Helebê** û çû bû **Istanbolê** bo wan pareyan, ên ku jê re bi rêya postnameyê hatine hinartin, bi dest xwe ve bîne.



**P:** Elî Riza ji Helebê çûbû Istanbolê bo bi hevxiştina hinek bazarkirinên diravî û di wê gerana xwe de hinek kes dîtin. Ma ne serhildanê li gor tiştên di wan hevdiştinan de biryar bûne destpê kir?

**B:** Dema kurê min hatiye, ez hîngê ji Palo derçûbûm. Lew re me li şoşirê hevdu dîtibû. Ew jî berî serhildanê bi çil rojan bû.

**P:** Gava Hûn hatine pîrskirin, bo çi hêriş li ser Diyarbekir çê bû? We gotibû ku ew li ser rêya We bû. Ma te ev negot?

**B:** Me dixwest, em têkevin wilayeta Diyarbekir ji ber ku ew ji me ve nêzîktir bû û gelek hembarên “Xezneyên” wê yên çekan hebûn û pêdiviya me bi wan hebû.

**P:** Gava Hûn di hêrişa ser Diyarbekir de bi ser neketin û Hûn binzorê dest jêberdanê bûn, We hîngê çi armanc kir?

**B:** Em vegeyriyan Çibiqcor li Darahênê û li wir xelkê ji herêmê xweşhatina me kir û ji min xwestin ku ez serlêdana Licê bikim, hema niyeta wê serlêdanê li ba min tune bû û min bo Kurdan destûr da, ku vegeyriyan malên xwe û pişt re ez çûm Icilê û li wir min bihîst, ku Mûwan û Erxenî ketine dest hêzên mucahîdan.

**P:** Li Icilê gelek Turk hebûn, bo çi We ewan nexistin tevgera îsyane?

**B:** Ez çûm bi aliyên Icilê ve li Erxenî û li wir min ji Turkan weke Kurdan xwest ku ola xwe biparêzin û daxwaza bi karanîna zagonên rêbazê bikin.

**P:** Ma Turkên wan herêman tev li îsyana We bûn?

**B:** Li wir, li Erxenî, şewqî efendî, Hemîd efendî û Hacî Husnî hebûn.

**P:** Evana Kurdin an Turkin?

**B:** Evana Turkin û tev li serhildanê bûn.

**P:** Ma te hebûna hîç komelê ke kurdî ya neteweyî bihîstibû?

**B:** Ez bi hebûna çî komeleyan ne agahdar bûm.

**P:** Ma te hebûna komeleya “Tea’lî Kurd” nebihîstibû?

**B:** Ez nizanim ew komele li ku ye û ne jî dizanim kî bi wê karî radibin.

**P:** We ji kê dixwest zagonên rêbazê bi kar bînin?

**B:** Zagonên rêbazê îro çol bûne “hatine tal kirin an vala kirin- Wergêr”. Rast e ku ev talbûn ji zû ve di serdema hinek sultanên de destpê kiriye, lê kesekî zagonên îslamî ji kar dernexistin. Ma ne daxwaz ewe ku em bersiva banga Xwedê bidin, bi rêya bi karanîna zagonên wî? Ev histobarî dikeve ser milên paşeyan “xelîfeyan”.

**P:** Mebest ji paşeyan çîye?

**B:** Mebest ewên ku rêberiya netewê dikin û zagonên ku ji rêbazê pêda bûne bikar tînin.

**P:** Ma te dixwest, tu bibî xelîfe “şûngir” ?

**B:** Hebûna şûngir hêminiya bingehîn e bo bi karanîna stûnên olê û ev pîrs armanceke rêbazî ye.

**P:** We got, ku Hûn tiştêkî li ser komeleya Tea’lî Kurd nizanim. De werin bo me bibêjin, çîne wan tiştên We li ser wan bi Yusif Ziya begê Bedlîsî re peyivîne, dema ew hatibû serlêdana We?

**B:** Herê. Ez **Yûsif Ziya begê**, ku hatiye serlêdana min, dinasim. Ew serlêdan jî li ser daxwaza **Heyder efendî Bedlîsî** bû, mamostayê min î berê, ku bo min gotibû, wê **Seyda Reşîd Mûşlî** û **Yusif Ziya beg** bên serlêdana min. Pişt re ji min re got ku **Seyda Yusif Riza beg** nûnerê **Bedlîsê** di **Encumana Neteweya Turkî** de ye, lew re min xweşhatina wan kir. Ewan çend sae'tan li ba min rûniştin û piştî me çayê bi hev re vexwar ewan çûn. Piştî demeke kurt û "*bi taa'yîn*" di rojên biharê de **Yusif Ziya beg** hat **Xinîsê** û serlêdana min careke dî kir. Li wir, ez agahdar kirim ku ew li gel komikeke ji hevalên xwe ji **bo avakirina dewleteke kurdî ya serbixwe** kar dike. Min got eve karber nabe (*bi cîh nayê*) û eve li dilê min xweş nayê.

**P:** Çewa te dizanî, ku fermandarî guh nade zagonên rêbazê?

**B:** Min hinek nivîştên **Ehmed** û **Evdillah Cewdet**, ê ku ez navê wî baş nizanim, xwendin. Vî kesî di rojnameya "**Sebîlurreşad**" de nivîsand, **Mûsa** - *silava Xwedê lê be* - mirovekî qure "*pozbilind*" bû, **Isa** namdar bû û **Muhammed** emîn bû û her yekî ji wan olek bi xwe re anî, ma çewa hemî hişdarên netewê nikanin oleke nû bînin?... Xwendina gotarên ji vî terzî ez gelek dihingirandim "*xeyidandin*" û wek çewa rojnameya "**Sebîlurreşad**" nûçeyek belav kir, ku **Kiliç Zade Heqî** nûserê **Ezmîrê** gotarek nivîsandibû, tê de ziman avêtibû ser pêximberê Xwedê û **Hesen Fehmî**, ku muftî ye li dadgehê gilî li wî vekiribû, lê dadgehê ewê derewkar û dev avêtiye ser pêximberê Xwedê bêşûc kir û ewê muftî bû bersûc kir û daxwaza cezayekî diravî ji sed lîreyan ji muftî kir. Pişt re dadgeha gilîvedanê "*temyîzê*" ew ji wî cezayî azad kir. Nimûneyek dî ewe, ku fermandariyê xaniyê **şêxaniya Islamî** (*li Istanbulê- Wergêr*) kiriye dibistana kiçan û kiç di wê dibistanê de fêr dibin piyano û kemanê û şevder dibin. Xwendina van nivîştan dilê min gelek diguşişin, wek min ji **Ilyas Samî** jî, nûnerê **Mûşê** di parlemanê de, bihîstiyê û ji du hevalên wî, nivîstek bi navnîşana "**Al- Ridde**" (*ji olê cuda bûn- Wergêr*) têde gelek neqencî avêtine ser şûngirên pêximberê Xwedê û hejmarek ji rojnameya "**Sebîlurreşad**" tune ye, ku ji nûçeyên van gotarên bêşerm û yên xeyda min tûjtir dikişin, bêpar e. Bi ser ve jî wan gotarên di rojnameyên Istanbulê de, ku pesna **Masoniyê** û **Bêoliyê** dikişin, hevîrkê min î îslamî, ji ber ku min nikanî van tiştana bi asanî daqurtînim, nema ev yeka bipejiranda..

